KU

# Broşurên ji bo xerîdarên li ZZC (Girtîgehê)


Co-funded by the European Union

Consortium of Migrants Assisting Organizations

Simi Association for Integration and Migration

organization for aid to refugees

INBÁZE




- Prag, Brno: bajarên mezin ên komara Çekê
- Navenda peşwazîyê: Balafirgeha Pragê-Ruzyne, Zastávka
- Navenda binçavkirina biyanîyan (Girtîgeh): Balková, Belá-Jezová, Vyşnî Lhoty
- Navenda rûniştinê: Belá-Jezová, Kostelec nad Orlici, Zastávka, Havîrov

## Tesîsa ji bo binçavkirina biyanîyan (Girtîgeh) çi ye?


- Jê re dibêjin binçavkirin an „girtingeh“, bi kurteyî dibêjin ZZC.
- Ew sazgehek girtî ye ku biyaniyek nikare jê derkeve.
- Polîsên biyanîyan û Wezareta Karê Hundir biyaniyên ku li.
- Komara Çekê dijîn an jî bi binpêkirina qanûnê ketine Komara Çekê (mina wa kesên bê pasaport an bê vîze) li saziyê bi cih dikin.

## Çiqas dirêj hûn dikarin di girtîgehê de bimînin?

- Divê hûn ji 180 rojan zêdetir lê nemînin. Bi awayekî awarte, polîs dikare vê heyamê heta 545 rojan dirêj bike.
- Malbata ku zarokek wan biçûk heye, dibe ku ji 90 rojan zêdetir nemîne li girtîgeha biyaniyan SERLÊDANA PARASTINA NAVNETEWEYÎ LI ZZC.
- Di vê demê de polîs dersînorkirina we an jî veguhestina we bo welatekî din amade dike.

## Serlêdana parastina navneteweyî li ZZC

- Hûn dikarin di hûndirê 7 rojên girtina xwe de daxwaza parastina navneteweyî (azyl) bikin.
- Divê polîsê biyanî bi awayekî rast we li ser vê îhtîmalê agahdar bike.
- Serlêdana ji bo parastina navneteweyî mafê we nade ku hûn ji saziyê derkevin. Wezareta Karê Hundir dê li ser daxwaza we dozên cuda bimeşîne (hûrgiliyên li jêr).


Veger / Radestkirin
Binçavkirin
7 roj
ji bo parastina navneteweyî
90 roj
Dema herî zêde ji bo malbatan û biyaniyên biçûk




**180 roj**
Dema herî zêde ji bo biyaniyên mezin

Îmkana dirêjkirina binçavkirinê

**545 roj**

Ji bo çi hûn li wirin?

Hûnê werin vegustin li ser bingeha peymana Dublînê ji bo welatekî din ê endamê Yeketîya Ewrppî

Hûnê werin veguhestin li ser bingeha peymana vegerê

Hûn bê belge û vize hatibun Komara Çekê

Hûn bê destûra kar xebitîbun

Hûn xeterê temsîl dikin ji bo Komara Çekê

Hûnê werin sirgûnkirin welatê xwe yê eslî

Hûn bê belge û vîze mayîbun li Komara Çekê

## Navenda pêşwazîyê çî ye?

- Navenda pêşwaziyê ji bo bicihkirina serlêderên ku nû hatine ji bo parastina navneteweyî (azyl), heta dawiya gavên têketinê, wek verastkirina nasnameyê, şopandina tiliyan, hevpeyvîna têketinê û lêpirsîna civakî, muayeneya bijîjkî tê bikar anîn.
- Heta dawiya gavên têketinê, mirov nikarê bi serbestî ji navenda pêşwaziyê derkevê.
- Li Navenda Pêşwaziyê ji we re rûniştin, xwarin, pêdiviyên bingehîn ên paqijiyê û lênihêrîna bijîşkî tê peyda kirin. Serlêderên parastina navneteweyî li vir bigihîjin karûbarên civakî û psîkolojîk û dikarin beşdarî çalakiyên dema vala bibin, biçin atolyeyên hunerê, hwd.

## Navenda rûniştinê (razanê) çi ye?

- Navenda rûniştinê ji bo bicihkirina serlêderên ji bo parastina navneteweyî yên ku prosedurên têketinê yên destnîşankirî li Navenda Pêşwaziyê derbas bûne, ji bo dema serlêdana wan a ji bo parastina navneteweyî tê bikar anîn.
- Serlêder dikarin ji navenda rûniştinê bi serbestî derkevin. Û ew dikarin biçin xaniyên taybetî.
- Xizmetên ku têne pêşkêş kirin mîna yên li Navenda Pêşwaziyê ne.

## Ew çi ye?

### Parastina navneteweyî

Parastina navneteweyî tê dayîn ji biyaniyên ku li Komara Çekê ne û ji bo wan ne ewle ye ku vegerin welatê xwe. Mîna wek li welatê wan şer heye yan jî ji ber nêrînên xwe yên siyasî di bin xetera çewsandinê de ne.

Du cureyên parastina navneteweyî hene: penaberî (di wextê de bêsînor) û parastina pêvek (di dema sînorkirî de, bi îmkana dirêjkirinê).

Wezareta Karê Hundir biryara dayîna parastina navneteweyî dide. Ger hûn serlêdana parastina navneteweyî bikin, Wezareta Karê Hundir dê bi hazirbûna wergêrekî bi we re gelek hevpeyvînan pêk bîne. Wê bê piskirin çina sedemên ku we ji welatê xwe derketine û ka hûn dikarin bi ewlehî vegerin welatê xwe yê jêderê lêkolîn bikin. Wezaret di derbarê welatê we yê jêderê wê agahiyan bistîne. Hûn dikarin pêşniyar bikin ku wezaret rapor û delîlên taybetî li ber çavan bigire. Û dîsa jî mafê we heye ku hûn doza xwe bi parêzer û Komîseriya Bilind ji bo Penaberana Neteweyên Yekbûyî (UNHCR) re nîqaş bikin.

Wezareta Karên Hundir mecbûre di nava 6 mehan de biryara parastina navneteweyî bide. Di rewşên awarte de, muhleta biryarê dibê were dirêj kirin.

Vebijarka we heye ku hûn li dijî biryara neyînî doz vekin. Heger hûn dozê venekin, hûn neçar in ku ji axa Komara Çek derkevin.

### Derxistina îdarî

Ev biryareke li gorî wê hûn mecbûrin ji Yekîtiya Ewrûpayê derkevin. Polîs dê ji bo we demek qedexekirina têketinê destnîşan bike, di wê demê de hûn nekarin vegerin YE Yeketiya Ewropayê.

Hûn dikarin biryarê di nav 10 rojan de piştî agahdarkirinê îtîraz bikin.

Ger îtîraz bê redkirin, hûn dikarin di nav 10 rojan de dozê vekin û şekayetê bidin.

Qedexeya an yasaqîya ketina nav axa Yekîtiya Ewropayê bi gelemperî ji nîv salekê heya 10 salane. Ger hûn bi dilxwazî sefer bikin, hûn dikarin serlêdana kêmkirina qedexeya têketinê bikin.

**Biryara veguhestinê (Dublin, vegerandin)**

Biryara li ser veguheztina ji bo dewletek din a Yekîtiya Ewropî an dewletek din ku berpirsiyare ji bo nirxandina serlêdana we ya ji bo parastina navneteweyî li gorî Rêziknameya Dublin. Heger we li Romanya an Bulgarîstanê serlêdana penaberiyê dabê, wezaret dê biryarê li ser veguhestina we bo vî welatî bide.

**Biryara li ser ferzkirina derketina ji herêmê**

Ev biryareke li gorî wê hûn mecbûrin ji Yekîtiya Ewrûpayê derkevin. Lêbelê, ew qedexekirina têketinê têda nîne, wekî di derxistina îdarî de. Piştî ku hûn vegerin welatê xwe, hûn dikarin tavilê serlêdana vîzeyê bidin hemî welatên Yekîtiya Ewropayê.

**Ferzkirina derketinê**

Wezareta Karên Hundir an jî polîs dê biryara derketina we bidê. Ferzkirina derketinê, mafê we dide ku hûn ji bo dema pêwîst ji bo avêtina gavên lezgîn ji bo derketina ji herêmê bi awayekî qanûnî li herêmê bimînin (wek danîna bîlêtên balafirê).

Ev dem nikare ji 60 rojan dirêjtir be û tenê di rewşên awarte de dikare were dirêj kirin. Demjimêra mayînê di ferzkirina çûyînê de ji hêla polîs an jî Wezareta Karên Hundir ve tê destnîşankirin. Ger hûn vê heyamê derbas bikin, hûnê bi qaçaxî li Komara Çek bimînin.



## Ew çi ye?

### Vegera bi dilxwazî

Biryara bi dilxwazî ji bo vegerandina welatê ku tu hemwelatî yî, yan jî li welatekî din ê ku destûrê dide te ku tu têkevê.

Heger hûn biryara xwe bidin ku hûn vegerê bi dilxwazî, Wezareta Karê Hundir dê nîvê lêçûnên rêwîtiya we (bilêtên balafirê) bidê. Heger hûn bixwazin vegera bi dilxwazî, hûn dikarin ji polîsên biyanî jî bixwazin ku dirêjahiya qedexeya têketinê ya ku di biryara derkirina îdarî de li ser we hatî danîn kurt bike.

ZZC bi rêkûpêk ji hêla xebatkarên Wezareta Karên Hundir ve tê ziyaret kirin, wan kesên dê vê vebijarkê ji we re rave bike. Parêzer an xebatkarê civakî jî dê bêtir agahdarî bide we.

Piştî vegerê em neçarin nîvê din ê lêçûnên rêwîtiyê jî bidin Wezaretê.

Heger hûn van mesrefan nedin, dibe ku hûn di pêşerojê de bi wergirtina vîzeyê an destûra rûniştinê ya ji bo têketina Komara Çekê pirsgirêkên we hebin.

### Biryara binçavkirinê

Biryara polîsên biyanîyan û Wezareta Karên Hûndir ya der

barê bicihkirina we ya ji bo binçavkirina biyaniyan de. Di biryara binçavkirinê de polîs an jî Wezareta Karên Hundir dê diyar bikin ka çima we di vê derê girtî de bi cih dikin. Wê ji were rave bike ka ew li gorî kîjan qanûnê û heta kengî we li gitîgehê bêlin. Polîsên biyanîyan an jî Wezareta Karên Hundir dikarin girtina we heta maweya destûrî ya herî zêde (180 roj) çend caran dirêj bikin.

15 roj dema we heye ku hûn li dijî biryara girtinê îtîrazê bikin.Parêzer wê di nivîsandina dozê de ji we re bibe alîkar. Serlêdana şikayetê li dijî binçavkirinê (girtinê) nikare mayîna we ya li ZZC dirêj bike. Dadgeha serbixwe wê hingê li ser girtina we biryarê bide.

> ! Heger dadgeh biryarê bide ku girtina we neqanûnî ye, divê hûn tavilê werin berdan. Û her weha jî mafê we heye ku hûn ji bo sînordarkirina neqanûnî ya azadiya kesane daxwaza tezmînatê bikin.

## Ji çi xwe biparêzin, ji bo hûn neçin ZZC (Girtîgehê):

1. Haj tarîx qedandina pasaporta xwe hebin, destûra rûniştinê an vîzeya xwe kontrol bikin. Ji bo dirêjkirinê di demek baş de berî tarîxa qedandinê serlêdan bikin.

2. Biryara nîgatîv, fermana derketinê an derxistina îdarî di wextê da çareserî bikin. Çaxa ku hûn nameyek, ji Wezareta Karên Hundir an jî ji polîsên biyanîyan va an rayedarên din werdigirin, di zûtirîn dem de hûn randevûyekê ji bo şêwirmendiya qanûnî bistînin.

3. Bê peymana kar û destûra xebatê nexebitin.

4. Hevkariyê nekin bi wan kesên gumanbar re an jî kesên ku soz didin ku belgeyan ji bo berdêlên bilind pêvajoyê bikin re. Qet belgeyên sexte qebûl nekin û bikar neynin.

5. Hemî belgeyên ku destûrê didin we ku hûn li Komara Çekê bimînin li gel we bê.



## Hûnê kê bibînin li ZZC (girtîgehê)?

**Karkirê sosyalê**

Ew ê agahdariyên bingehîn li ser mafên we û rewşa li ZZC (Girtîgehê) bide we. Ewê bersiva pirsên we ji we re bêjê.

Ew ê ji we re di kirîn, cilşûştinê, hewcedariyên paqijiyê de (di nav de hewcedariyên menstrualiyê) an guhertina menuyê de alîkariya we bike.

Ger pirsgirêkek we hebe û tiştek hewce bike ewê ji we re bibe alîkar.

Ew ê ji we re bibe alîkar ku hûn karûbarên werger, tenduristî û yasayî saz bikin.

Ew ê ji we re bibe alîkar ku hûn ji bo dawiya rûniştina we ya li ZZC (Girtîgehê) amade bibin (bi veguhestina navenda rûniştinê, ji bo welatekî din ku berpirsiyariya serlêdana we ya penaberiyê ye, an jî bi amadekariya vegerê bo welatê jêderê).

**Parêzer(Awoqat)**

Ew ê di derheqê pêvajoyên ku we eleqedar dikin, mafên we û rewşa we ya li ZZC de agahdariya bingehîn bide we. Ew ê bersiva pirsên ji we re bêjê.

Ew ê rewşê ji we re rave bike û ji we re di amadekirin û vekirina îtîraz an dozên têkildarî derxistina îdarî de, têkildarî biryara li ser mecbûriyeta derketina ji herêmê, biryara li ser veguheztinê, biryara neyînî ya di mijarê de ji we re bibe alîkar û ji bo parastina navneteweyî an jî biryara binçavkirinê ya li ZZC (girtîgehê).

Parêzer dikare daxwaziya gihîştina qeydên we yên bijîjkî bike. Ger di têlefona we de delîlên ku ji bo doza we girîng hebin, parêzer dikare daxwaz bike ku têlefona we ya desta carekê ji we re peyda bikê.

> ! Alîkariya huqûqî belaşe û werger ji we re heye
>
> Parêzer mecbure gutinên we biparêzê

## Kesê din ku hûn karibin li ZZC'ê (girtîgehê) bibînin?

**Xizmeta bêrawestan**
Di rewşa akût û acil de 24 demjimêran alîkarî.

**Bijîjk / Hemşîre**
Ger pirsgirêkên we yên tenduristiyê hebin dê alîkariya we bike.

**Karûbarê ewlehiya taybet**
Berpirsiyarê ewlehiya we li ZZC (gitîgehê).

**Pedagog / Mamoste**
Ew ê çalakiyên dema vala pêşkêşî we bike, ew ê di hînkirina zarokan de bibe alîkar.

**Psîkolog**
Ger hûn bixwazin bi kesekî re li ser pirsgirêkên xwe bipeyivin ew ê ji we re bibe alîkar.

**OAMP**
Xebatkarên Daîreya Polîtîkayên Penaberî û Koçberiyê ya Wezareta Karên Hundir a Komara Çekê.

**Karmendê xanî**
Ew ê ji we re kincên nivînan an jî tiştên paqijiyê peyda bike, ew ê di şûştinê de alîkariya we bike.

**Karmendên piştgirî**
Aşpêj, tamîrkar.

**Polîs**
Endamên polîsên biyanî.

# Çi ji we re heye?

**Cihê razanê**

**Rojê 3 caran xwarin** (rojê 5 caran zarok) bi vebijarka hilbijartina pêşî dema ku têkevin sazgehê

**Perwerdehiya zarokan**
bi giranî li ser hînkirina zimanê Çekî

**Çalakiyên dema vala**
(odeya TV, atolyeyên hunerî, pirtûkxane, werzîş, hwd.)

**Lênêrîna bijîjkî ya acîl**

**Înternet**

**Telefona automat**

**Pêdiviyên paqijiyê**
(paş, tampon, rîspî)

**Xizmeta Civakî û**

**Alîkariya hiqûqî ya belaş**

## Hûn li ZZC (girtîgehê) çI karin û nikarin bikin?

**Hûn nikarin bê destûra polîsan ji ZZC (GIRTÎGEHÊ) derkevin.**

Divê hûn mafên xwe yên maqûl sînordar bikin (mîna mafê azadiya tevgerê, mafê nepenîtiyê).

**ZZC (Gitîgeh) li 2 beşan dabeş dibe – beşek bi rejîmek nerm û beşek bi rejîmek hişk.**

Ger hûn êrîşkar bin û rêgezên ZZC Girtîgehê neşopînin, cîhaz dikare we biguhezîne beşek bi rejîmek hişk, ku lê çavdêriya zêde heye.

**Hûn dikarin heftê carekê pakêtan bistînin, herî zêde 10 kg.**

**Hûn dikarin heftê 4 caran, herî zêde 1 saetê serdanê (ziyareta) bistînin.**

**Piştî ku hûn ji ZZC derketin, hûn ê fatûrê bistînin, ku mîqdara ku hûn ji bo mayîna xwe ya li ZZC-ê (Girtîgehê) bidin hesab dike.**

Ger dadgehê dît ku dabînkirina we neqanûnî ye, wê hingê hûn ne mecbûrin ku ji bo mayîna xwe li ZZC pera bidin.

**Dema ku hûn têkevin ZZC (Girtîgehê), divê hûn têlefona xwe ya desta, pere û kartên dravdanê bidin dest.**

Mafê we heye ku hûn bi telefona 3 deqan telefon bikin. Mafê we heye ku hûn hejmarên têlefonê ji têlefona xwe kopî bikin. Hûn dikarin têlefonê bikar bînin da ku telefpn bikin bi telefonên automat.

**Hûn dikarin nameyan bê sînor bişînin û bistînin.**

**Hûn dikarin bê sînor drav (pera) bistînin**

(lê divê hûn wê hilînin ji bo parastinê). Ji bo kirînê (mîna xwarinê û cixare) hûn dikarin heftê carekê pereyê xwe bikşînin heta 300 CZK. Ew karkir ji bo kirînê ê alîkariya we bike.

**Hûn dikarin bi azadî di bin rejima ewlekariya nerm de serbest bigerin.**

## Rêxistina ji bo alîkariya penaberan – OPU

**OPU Li Prage**

Poděbradská 5, Praha 9, 190 00
+420 730 158 779, +420 730 158 781
www.opu.cz
opu@opu.cz

**OPU Brno**

Josefská 8, Brno, 602 00
+420 731 448 938, +420 731 928 388
www.opu.cz
opu.brno@opu.cz

**OPU Ostrava**

28. října 81/203, Ostrava 9, 709 00
+420 604 221 035, +420 731 502 661
www.opu.cz
opu.ostrava@opu.cz

**OPU Pilsen**

Skvrňanská 1111/12, Plzeň, 301 00
+420 604 809 165
www.opu.cz
opu.plzen@opu.cz

**OPU Hradec Králové**

Nerudova 18/39, Hradec Králové, 500 02
+420 733 278 174
www.opu.cz
opu.hradeckralove@opu.cz

## Komele ji bo integrasionê û koçberîyê – SIMI

Havlíčkovo náměstí 2, Praha 3, 130 00
+420 224 224 379
www.migrace.com
poradna@migrace.com

## InBáze

Krumlovská 527/4, Praha 4, 140 00
+420 732 361 882
www.inbaze.cz
info@inbaze.cz